# کێڵگەی زامان

**مسیب قەرەداغی ـ سلێمانی**

جەستەم کێڵگەی برینانەو رۆژگاریش دێت
تۆوی زامان دوەشێنێ لەم کێڵگەدا!
لە نێرینەی هەر زامێکدا، کڵپە مەشخەڵی جلووسە
ئازار چەپک چەپک دەکەم، دەیدەم لە قژی خەمەکان
ئەم کێڵگەیە زۆر بە پیتەو بەرێژنە
دنیای منی پێوە بەنە..
برینی خۆمم خۆشدەوێ ... دەردی لە لەشی
ساغ کەوێ
ئازار پاکی دەکاتەوە ... برینی نوێ دەخاتەوە
هەڵدەتۆقێن، دەبنە چەتر
دزانێک دێن دەچنە سایەی
بە زۆر دەبنە ئایەو مایەی!
چ بکەم خۆ من هێزم نییە، دزان راونێم
من هەر دژی هێز و چەقۆ و شیر و تیرم
بەرامبەری هەر کوتەکێک، داگیرکەرێ دێتە بیرم
کەوچکێک ژەنگ دەکرێتە نێو چاوی شیرم.
ئای دزەکان، کێڵگەی زامانم پیس مەکەن
مەیکەن بە گۆڕی رمبازی
مانا نایەم بۆ پاکسازی
پاکێک نییە ئەرکێکی وای لە ئەستۆنێم
ئێوەی دزەل، زامم مەکەن بە سەنگەر و
خەمم مەکەن بە رابەر و
لێوم مەکەن بە قەڵەم و
چاوم مەکەن بە تووتکەی راو
خەونەکانم مەکەن بە زێرابی وشەی ناو دەم و کاوێژتان
مەمکەن بە بەڵگەی راوێژتان
برین شیعرە، دەشێ بکرێت بە گۆرانی
برین مەیە، دەشێ بخرێتە سەر خوانی عاشقەکان
برین چاوە، دەشێ لەودیو کێوی بەرزی قافانەو شت
ببینێ
برین گوڵە، دەشێ جوانێک بیکاتەوە و بیدا لە خۆی
برین وەها شەقامێکە، بۆ تۆش هەیە پیادا بڕۆی برین
بوو بە سوێندی تە ریم // بە ئایەتی قورسی تەجریم
برین لەسەر لەو ەی جەمم هەڵدەواسن
لە پێش دەسی دزەکاندا ساڵنامەیە یا تەقویمە؟
ئەژنۆی شکاوی تەسلیمە؟!
ئای زامەکان.. هەر یەکەتان مەوارێکە لە کوچەرێی
تەمەنی بێ تەمەندا
هەریەکەیان سەرمۆر گێری شیعرەنێکن خەفەم کردوون

هەتا ئەوەک لێوی سووری کچۆڵەیە،
لە خەویشا دەم و لێوم بۆ نەبردوون
برین ئامانە، برین ئامانە
وارم ئەزەرگەی شێخی زامانە
دەســـتم دامــێنت، تەپڵت دەنگی بێ
میحرابی ئاخت سەرانی زەنگی بێ
جامانی دەستت با لێوان لێوبن
ئەگریجە و پەرچەم دایم پەرشێوبن
باوەشت گەرم و زارت بە فەڕبێ
وەرزی فرمێسکت بەهاری تەڕبێ
کە دەم رووتێ هات بانگی جەژنیدا
تفت پشکۆ بێ و هەردوو کوێت کەڕبێ
ەلاجەکانی سەر جەستەم ـ برینەکان
شمشاڵەکانی مەولانای رۆیمی مەزن
فرمێسکەکانی مەعدومیی شێنی عەنبەر
خۆش مرووره شەماڵەکەی مەلا خدر
ئازارە زۆر گەرمەکانی زار و خامەی (بێشکچی) مان
ئەوەی هەیە و ئەوەی دیمان
چییان بۆمان بەرجەستەکرد؟
چییان بەم قورە خەستەکرد:
ـ گرتیانەوە؟
هێنایان و بردیانەوە.
دوێنێ زارێک لە زارەکان
دوێنێ دارێک لە دارەکان
کەوتە سەر وێرەی هەردووکمان
وەکو دەرد و وەکو ژانێک
دەستی نایە بینەقاقای هەر وجانێک
باشووری ئەپاندە سەر خەندەی گشت پەیانێک
برینەکەم
ئەی هاوسەری دەیان ساڵەم
دان پیانانە ... من هێشتاکە ئەو منداڵەم...وام دەزانی
پیاو کوتەکە
ەق شەتەکە
وەهام دەزانی، راست دەکا ئەوەی دەڵێ ـ تا پەتەکە!
کاتێ تەماشای دۆزم کرد
کاتێ تەماشای رۆخم کرد
سۆشیال تێلا چوو بەگژما
ناسیۆناڵی دیموکراسی دایگرتمەوە
مێــژووم لێبــوو بە ســەگی هار... لەم ناوە دووری
خستمەوە
دزان جرتیان تێدەگرتین
جرتێک بۆ من
دوو جرت بۆ تۆ
سەد بۆ کوردایەتی و برواى هەزارانی وەک من و تۆ.

تابلۆی هونەرمەند رێبوار سەعید ـ لەندەن



# ئیپۆسی هەرەس

**مهاباد قەرەداغی ـ سوید**

لەوێوە نامەی چرچم پێدەگا،
لۆچەکانی پڕن لەو گوناهانەی
ساواکان بەدەم کرۆکاڵە هەواییەکانیانەوە
لەسەر زەمینە میناوییەکانی مێژووی وەهم و
لەسەر لێوارە زاماوییەکانی هۆشدا دەیانکەن
ئەو گوناهە جوانانەی ـ کە سزاکانیان شەرمەزارکردووە
ئەو گوناهە نازدارانەی ـ کە عەشقیان ماندوو کردووە

لەوێوە.. لەئاونیشانە نادیارەکانی سەر نەخشەی وەفاوە
لە ئەکتەرە کۆمیدیەکانی سەر شانۆی ونبوونەوە
نامەی قژدرێژی ئاڵۆزکاوم پێدەگا
پڕن لە راپۆرتی پرشنگداری تاوانی جوان، جوان
پڕن لە بۆنی ئیپۆسی هەرەس
ئەو تاوانە رازاوانەی کە تەرازووەکانی هیوایان لارکردووە

نامەکان پڕن لەزەنگ
زەنگی کۆتایی هاتنی وانە پڕج خاوەکانی رووناکی
زەنگی ئاوابوونی ژیری
ئەو زەنگە ئەخۆشانەی کە بیریان پیرکردووە

هاوڕێ، چیاییە، دەریاییە، شارییەکانم
بەدەم خەونێکی مۆگناتیسیەوە،
نامەی نێجگار کراوەم بۆ دەنووسن
نێجگار سادە
لەبەرەکانی جەنگەوە نامەی خۆشەویستیم بۆ دەنووسن
جەنگی نێوان گوناه، و گوناه،
جەنگی نێوان سزا، و، سزا

لێرەوە، لەپاڵ دارژاڵەیەکی سەرسامی رەچیوەوە
زام و گوناه و سزا و تاریکی و
ژانی رەنگینی ئەوان، دەخوێنمەوە و
رۆ م بە لقێکی تاڵی ئەمر گرێ دەدەم

لێرە ـ هەموو شتێ ـ
بەفرە زەنگاوییەکان
لقە کەڕووهەڵهێناوەکان
ماچە دوکەڵاوییەکان
هەموو شتێ....
ئەوێی رابووردووی مەرگاوی، و
ئێستای دۆزیخی، و
سبەینێی شەوەزەنگییم بیردەخەنەوە.

لەوێ خۆرێکی سەرابی هەڵدێ
تیشکی قەترانیی
رۆشنایەکی رەش
لەوێ هەنگاوە زیگزاگیەکان..
ئیپۆسی هەرەس دەنووسن.

ئیپۆس : مەلحەمە، داستان

# لەخۆگەڕان

**خەبات عارف ـ سوید**

کەسێ بە باڵای خەمم دەگرێت و
کەسێ لەبەر گەلارێزانی پێکەتینا
جێیەک بۆ رۆ ی تاساوم دەکاتەوە.
کەسێ دەمباتەوە بۆ ساتەکانی پێش لەدایکبوون و
دەستم دەخاتە نێو دەستی فریشتەکانی مەرگەوە،
لە دیاری پاکی خۆشەویستیم دادەبڕێ و
بە دەرباری نائاشنایانی دوێنێ و سبەینێم دەسپێرێ.
کەسێ دەرگایەکی دڵی خۆی بە رووی خەونە لێڵەکانما
دەکاتەوە و
بە بەزەیی و سۆزەی گریان،
ماتەمینیم دادەپۆشێ
لە ساتە مەستەکانی تەنیایی و خۆبینیندا،
کەسێ رووبەرووی تەوژمی ژین و
کێژەڵووکەی تێکەڵبوونم دەکاتەوە.
کەسێ دەمباتە بەردەبازی رێم و
بەرەو کەنارەکانی بێدەنگی و
نێو خێوەتی تەنیابوونم دەباتەوە.
منیش لەم تاریکستانی نەبوون و هەبوونەدا،
لەدوای ناکەسێ دەگەڕێم،
بەر پێیەکانم رۆشن کا و
ناڵێ لە نووری جوانیی خۆی لەسەر چاوانم جێ بێڵێ.
کەسێ بە باڵای رقم دەگرێت و
کەسێ بە باڵای بڵندی خۆشەویستی.

# Mîn metirsiyekî kuşendey katî aştî

Mehabad Kurdî - Swêd


Le Cîhanda 110 milyn mînî çênraw heye. mîn, ziyatir be mebestî seqet kirdinî mirov û şêwandinî. perş û biêaw dekrêtewe û deçênrç. MAgnos Lîndêk le rekxirawî SIDA delê: " Mîn le nêwan postalî eskerî û qaçî minalêkda çi ciyawaziyek naka. Mînî take kesî yekê lew çekaneye ke le hemiwan ziyatir mayey riq lêbûneweye. Be taybetîş le ber ewey xelkî asayî le serbaz û leşker ciya nakatewe. Em çeke kuşendeye manay şer û aştî nazanê. Beşêkî gewre lewaney ke ziyaniyan pê dega afret û minalin. Afiretan her le diway şer westan rû dekene kêlge û meydanî kar. Minalanîş taezroy her ştêkin ke le zewîda bdoznewe, bizanin çiye û çiniye.

Kirîster Wêsterêzî, ke wek serbazi UN le Mozambîk karî paksazî mîn kirduwe delê: "Betaybetî xelkî asayî, le Asya û Efrîqa be hoy mînewe ziyaniyan lê dekewê. Ewey ke min bînîwme minalan û airetanin ke be xiraptîn şêwe dûçarî em derde debin. Katê mirov, jinanî minal le kol û dûgiyan le kêlge debîné, ewa ser encamî ew kare têgeyiştinî asan debê û karesat rûdeda. Kes nazanê çend rûdawî diltezên rû deda. Çendîn rûdaw her basîşyan nakirê. Le cîhanda iyatir le 300 cor mîn heye. Ke hîç kamiyan bewî dîke naçin. Çîn yekêke lew dewletaney ke tirsnaktrîn corî mîn dirust deka.

Mîn be şêweyekî wa dirust kirawe ke ziyanî corawcor le mirov bida. Bo nimûne; hela hela kirdinî ran û perandinî qaç. Mîn wa le serbazêk deka, ke carêkîtir newanê destî çek bigirê. Le heman katda mînekan temen dirêjin û metirsiyekanişyan çendîn sal diway ceng wesatanîş le zewî û kêlgeda her demênêtewe. Ser bazî siwêdî naw biraw delê: "Ême mînî pilastîkî waman doziwetewe ke desal buwe çênrawe, belam niwê diyar biwe.

EmrodaHereşey mîn bo nimûne gewretirîn kospe le berdem geranewey xelkî Angola bo ew nawçaney ke tûşî şer û şor bûne. Angola her çend wilatêkî dewlemendîşe, belam le ber zor bûnî mîn le kêlgekanda keresey xwardemenî û ber û bûmî tewaw berhem nahênê.

Pak kirdinewey zewî le mîn girane. Zor girantire le mîn xoy. Bilaw kirdinewey mîn be şêweyekî weha ber bilaw le cîhanda manay ewe degeyenê, ke çek herzane. Nirxî herzantirîn mîn le penca kironî swêdî (6 US$) têper naka. Eger wilatanî cîhan dest û birdane zewî le mîn pakbikenewe, kareke dîsanîş ta deyekanî 2000 tewaw nabê. Lerastî da pak kirdinewey cîhan le mîn le xeyalêkî xoş ziyatir ştêkî tir niye.




Welatanî dîktator û şerwaz be ciyatî welamdanewe be wîstî xelk mîn takekesî le ser zewî bilaw deken

Giringtirîn kar ke ême pêman bikrê, wişyar kirdinewey danîştiwanî em şwênaneye ke mîniyan têda çênrawe, le metirsî û karesatî em çeke tirshênere.

Le oktobrî parda, le şarî Wien da konfiransêkî cîhanî bo qedexe kirdinî bekar hênanî mîn le cîhanda, be taybetî mînî taqe kesî, bestira. Diwa encamîş biryarî qedexe kirdin serî negirt. Hîndûstan û Çîn le hemû dewletekanî dîke ziyatir dijî biryarî qedexe kirdin bûn. Çîniyekan be nardine derewey çek û keresey cengî pare bo maşênî şer û deselatiyan peyda deken. Le Siwêdîş goya, kargey Bofoş le salî 1993we wazî le dirust kirdinî mînî takek-kesî hênawe. Perlemanî Siwêdîş diway nîw sal berhem hênan û nardinewey em çekey qedexe kirduwe. Norwêj, Beljîk û Austriya le pêş dewletanî dîke em çekeyan be tewawî qedexe kirduwe.

Mînî take kesî

- Le cîhanda 110 m mînî take kesî heye, le le 64 wilatanda bilaw kirawnetewe.
- Le Afrûqa 18 - 30 Milyon, le Rojhelatî Nawerast 17 - 24 m mîn, le rojhelatî Asya 15 - 23 Milyon mîn û le Aurûpaş 3 - 7 Milyon mîn heye.

Ew wilataney ke ziyatir mîniyan lê çênrawe birîtîn le Angola, Efxanistan, Kamboc, Iran û Iraq.

- Her mangêk, be hoy teqînewey mîn, 2000 kes yan giyaniyan le dest deden yan birîndar debin. Le hendê wilatanda 30% ziyan lêkewtiwekan jin û minalin.
- Le beranber labirdin û der hênanî her mînêk, mezendey ewe dekrêm ke 20 î dîke le şwênî da biçênrê le seranserî cîhanda.
- Pak sazî kirdinî cîhan le mînî take kes lewaneye 1100 salî biwêt. Be mercêk eger hîç mînî niwêy dîke neçênrê.
- Nirxî labirdinî mînêk ser cade girantire le kirînî.
- Be layenî kemewe 340 mînî colraw cor le 48 wilatanda be hem hênrawin.

Hendêk lew wilataney mîniyan têda çênrawe

## Em cîhane seyre

### Jinêkî 63 saley Emerîkî minalî bû

Le Emerîka jinêkî 63 sale minalêkî bû. Helbete towekey î xoy nebû û le jinêkî dîkewe be minaldanî xirabû.

Em jine ke nawî rûn nekrawe le başûrî Kalîforniya dejî. Rewşî tendurustî minaleke çake. Minaleke 38 hefte be diway eme ke towekey le daykî serekî xoy be daykî êstay xira, le dayik bû. Bawkî minaleke 60 saleye.

Le Emerîka pizîşkekan be dananî towî jinêkî dîke, hawkarî em jinane deken ke minaliyan nabê. Belam bo em kare temen le berçaw degirin. Zortirîn temenîş bo em kare 50 sale. Pçrtirin jinêk ke minalî bû be pizûşkan raygeyandibû ke temenî 50 sale.

### Yekemîn perlemantorî musilman le Birîtanya be kirînî dengekan tawanbar kira

Mihemed Serwer yekemîn û tenya perlemanterî musilman le Birîtanya bewe tawanbar kira ke £5000 dawe be rikeberî xoy ke emîş musilmane bo ewey ke legel nawbiraw rikeberî helbijardin neka. Mihemed Serwer milyonêrêkî gewreye ke le Skatlend û Ingilîs be deyan firoşgay heye. Naw biraw bewe tawanbar kirawe ke parey be xelk dawe ta dengî pê biden.

### Le Kuweyt konsêrt û helperîn qedexeye

Le Kuweyt be pêy yasay niwê ke le perlemanî em wilatede pesend kirawe berpakirdinî aheg, konsêrt û pêşangay cil û berg qedexe kirawe. Le seretay em yasayeda hatuwa ke em kirdeweye dijî ayînî Îslame.

Seyr emeye ke le salanî diwayîda sermayedarekanî Kuweyt le USA û Aurûpa çendîn binkey mod û poşakî ciwaniyan heye.

## Forma abûnimana Jînî Niwê — Subscription Form

**Naw nîşan** **Address**
IKM, PO BOX 3044 Sudbury, Sufflok CO10 0FG, UK

**Rêkewt**

**Date** ....................

**Naw û nîşan – Name & Address**

Kerema xwe bi de xuya kirin:
Please indicate:

**Abûneya taze**
**New subscription**

**Abûneya xwe taze dikî**
**Subscription renewal**

**Hejmara abûnman** eger tizanin
**Subscription No.** (if known)

Kerema xwe midehê abûna xwe diyar bikin
Please indicate the subscription Period

**12 hejmar**
**12 issues**

**6 hejmar**
**6 issues**

Buhayê 12 hejmaran £15 bo Ingiltere û Aurûpa. £20 bo Emerîka û welatên din
6 hejmar £10 bo Ingiltere û.Aurûpa, £15 bo Emerîka û welatên din
Subscription rates: UK and Europe : 6 issues £10, 12 issues £15
US and other countries:6 issues £15, 12 issue £20

Min ......... bo abûnmana Jînî niwê bi
The omount ............ is forawarded:

**cheque**

**Yên din**
**other**

kerema xwe bdin xuya kirin çewan
Please specify

# Helbijartinî serek komar le Iran

bazarî siyasî Iranda nebûwe û serokî kitêbxaney giştî Iran bûwe. Be pêçewane dengdanî dengderan be Xatemî be nîşaney serheldan û destpêkî serdemêkî niwê le xebatî gelanî Iran bo azadî û mafekaniyan seyir debê bikrê. Xelkî Iran dengiyan da be Xatemî leber eweyke neyandewîst deng be Natiqî Nûrî Palêwrawî Xameneyî biden.

Dahatû nîşand deda ke Xatemî ta çende be sozekanî xoy wefadare û ta çende detwanê giriftekanî abûrî, ferhengî, siyasî û xizmete komelayetiyakan çareser bika. Le hemuwan giringtir Xatemî legel cîhanêk berew rûye ke be hoy dadigay Mykonos wilatekey be têrorîst nasrawe û Iran le hemû katêk ziyatir le terîkî syasî da be ser deba.



Xatemî le beranber taqîgay mêjûy gelanî Iran

Wilatanî Aurûpî, Amerîka û wilate erebiyekan le êstawe çiray sewziyan be Xatemî nîşan dawe. Clinton le witarî xoyda le 28 Mey le diway kobûnewey serokanî Nato mercî pêwendî girtin le gel Iranî idî be parastinî mafî mirov le Iran nebestewe û tenya bewe besende kird ke ger Iran terorism mehkû bika ewa pêwendî de gel Iran asayî debê.

Ewey aşkiraye helbijêranî Xatemî hoşdariyekî yekbêj bû bo rêberanî ayînî Komarî Islamî.

# Saraya 15 salî bû gor'iyê mêjî pûçan

Semedê M. Ehmad - Siwêd

Sara di sala 1981an de ji dayik bû. Dema dibe 10 salî digel malbata xwe lj Iraqê mişext tibin. Piştî mideheke li siwêdê hev û dû digirin û bi dîtina hev şa tibin.

Piştî vê ko çend caran dê û bavê Sara ji hev cuda tibin. Ev û xuşk û birayên wê cem bavê xwe, li durgeha Gottlandê, timînin. Piştê ko tê rohn kirin ko bavê Sarayê wê kut tide, dezgeha polîs wê ji bavê wê cuda dikin. Bi vî awaî Sarayê tibene Melbenda Êşkgir, Melbenda parastina van jin û keçana ko ji destê zebr û lêdana mêr û kes û karên wana qurtar dikin.

Ev cîhe gelek bi keyfa Sarayê tibe, di ber vê ji jiyana wê ber bi başiyê diçe. Piştî mideheke di ser rezamendiya polîs mala xwe wediguhozîte mala apê xwe. Sara gelek ji apê xwe ditirsa çunkî ev jî mîna bavê wê bû. Di ber vê jî Sara zû vegeriya Melbenda Êşkgirê.

Berî tewaw bûna sala 1996 an de Sara diçe serdana malbata xwe ku veguhastibûne bajarê Omeo, di rohelata bakûriye Siwêdê. Lê çahvê wê îdî bi durgeha Gottland nakeve. Çunkî di roja 15ê çirya paşîn (Desember) bi destê birayê xwe Hesen 16 salî û kur apê xwe Tarîq 17 salî tê qetlandin.

Çend hefteyeka berî vê bûyerê, kurekî tirk di Stokholmê bi kêr xwîşka xwe seqet dike. Her wisa du heftiyan piştê kuştina Sarayê, li bajarê Malmoe ya başûra Swêdê kurekî Lubnani jina xwe bi tawana wê ko mîna jine musilman reftar nekiriye, dikuje.

Renge di ser vê dinyayê bûyerên vilo gelek biqewimin. Lê hegera nivîsandina vê gotarê giringî dana midyaya swêdî bû bi bûyera Sarayê. Xasmayî gelek nûseran tawana parvemayîtî û dirindeyî dane ser hemî reşan. Hetanî kar gehişte kor û civîn girtin û lêvekolîna vê dozê, di aliyê gelek ji pispor û karnasên saykolojî û çandî û ayîniyewe. Evejî bûye benûştê ser zarê swêdiyan û kultûr û çanda rohelatê kefte ber sivikî û galte pê kirin. Eger ev kare her visa dom bike, şeqara navbera siwêdî û biyaniyên Siwêdê, vê mezintir bît.

Hege tawanbar, guneha van core karane dixene ser istûyê îslamê, ez vê nûsînêde naxwazim bînime ser ziman. Xo heke ayînekêjî "Fetwaya" wan qetlandinana bide, ewa pîrpozî van bibe.

Alyê dine vê gotarê, pakane kirina tawanbarane ko dibên: "Ev cure kiryarane di kelepûr û adetên mede bawin." Ewana bo dapoşîna tawanên xwe û bo kellereqî û parvemayîna xwe gunehan dikene istûyê edet û kultûrê. Bi baveriya wana ev kesên ko bi tehereka mirovanî digel hev dijîn û bi terazûya rêz û xoşivaniyê pêwendiyên xwe berçav dikin, di ser bingeha bawer bi hev û dû hebûn û ji hev gehiştinan pêwendiyên malbatê pêk tînin xwayiyê kultûr û daban nînin.

Sara hat kuştin di ber vê ko wê dixwest mîna mirovekê bi serbestî rêya jiyana xwe helbijêre yan ji alyê kêm wek bira û kur apê xwe biji. Lê Hesen û Tarîqi ev mafe nedan wê. Di demekê de evana bi xwe heryek qîzek siwêdî, weke dezgîran hene. Erê gelo eva rewaye yan dûrûyî û narowayî.

Di demekê de mêr gav, kiryar û xwastika taybete bi xwe bi rewa bizane, lê bo jinekê eva bive û awrû çon bête zanîn.

Hesen û Tarîq di bersîva dawakariya giştide, ko bo ev karane kirine dibên: "Me bi şanaziyewe ev kare kir, çunkî me şeref û awrûya malbata xwe parastiye." Heke şeref û awrûya malbatekê bi kuştina zaroyeka 15 salî bêt parastin nebûna vê qenctire.

Di midehê 10 salan kar kirina min di birêwe birina kar û barên penaberên welatên rohelat de gelek caran bûyerên dilşewitîn têne ber min. Min mêr dîne ko çewan bi zorî nan û kut tev hev di jinên xwe tidan. Dema dezgeha polîs û dadperweriya gişkî têkelî doza vana tibû, gelek bi heyrî digotin: "Kê divê lêre welatê demokrasî û serbestiye! Ey ewe nîne ewane xwe dikin nav kêşe û giriftên xêzananjî. Ewana çi karê wan bi meye, ko em çewan dijîn. Çanda wana cureke û ya mejî curek!

Gelo kîjan çand?! Ew kiryarane nîşana kultûrê e yan rengvedana kellereqî, parvemayî û nefamiya wanaye. Ewana awrû çonê di serbestiya jinande tibînin. Karê wana rojane bal berpirsyarê kar û barên komelayetê de hezar û yek diro kirine bo vergirtina diravek mişetir. Dest birîn û fir û fêl bingeha pêwendiyên rojaneye ewanaye. Ev karane di cem wane awrû çon û bê namûsî nîne. Lê dema Sara dixwaze rêya jiyana xwe bi xwe helbijêre, xwe ji destê dirindan rizgar ke, tewqa wê pêwendiya nemirovî bişkîne, di helwêsta nan, pên û destdirêjiye rizgar be, bira û kur apê wê ewa bi Sarayê rewa nedîtin û serşoriya malbata xwe tidîtin. Di ber vê jî Sara bi kemera pişta xwe xendiqandin û kotayî bi xwenên xwejî di gel wêne bê dom kirin.

Niho bo dadigehê (mehkeme) rohn bûye ko kuştina Sarayê di ser daxwaza bav û apê wê bûye û midehek dirêj bûye ko pîlanek çend kesî bo ji nav birina wê hatibû danîn.

# Afretêk le Pakistan be dilxwaz şû deka

Jînî Niwê - Lenden

Dadigayek le Pakistan biryarî da ke afretêk be dilxwazî xoy şû bika.

Afreteke le gel dilxwazekeyda pêkewe kar deken. Dilyan be yek dekewê û biryar deden jiyanî hawbeş pêk bênin. Bawkî kiçe razî nabê. Belam kiçeke le ser biryarî xoy paşgez nabêtewe. Bawkî kiçe kêşeke debate dadiga. Kiçeke le kureke ciya dekrêtewe û bo mawey 11 mangan dexrête kampî afretanewe.

Diway serbestî kiçeke le ser daway xoy sûr debê û be bê pirsî bawkî şû be dildarekey deka. Dadiga daway bawkî feramoş deka û kiçe û kure beyek şad debin.

Bizûtnewey mirovdostan piştîwaniyan le hengawî dadga kird. Gutyan eme pêşkare bo sedan kêşey lem babete ke çawarwanî çare ser kirdinin.

Eme hengawêkî bextewer bû bo take afretêk, belam bazêkî mêjûyî bû bo afretanî Pakistan. Lemew la ewanîş mafî helbijardinî hawbeşî jiyaniyan heye.

Afretêk le Pakistan be dilxwaz şû deka

Jînî Niwê - Lenden

Dadigayek le Pakistan biryarî da ke afretêk be dilxwazî xoy şû bika.

Afreteke le gel dilxwazekeyda pêkewe kar deken. Dilyan be yek dekewê û biryar deden jiyanî hawbeş pêk bênin. Bawkî kiçe razî nabê. Belam kiçeke le ser biryarî xoy paşgez nabêtewe. Bawkî kiçe kêşeke debate dadiga. Kiçeke le kureke ciya dekrêtewe û bo mawey 11 mangan dexrête kampî afretanewe.

Diway serbestî kiçeke le ser daway xoy sûr debê û be bê pirsî bawkî şû be dildarekey deka. Dadiga daway bawkî feramoş deka û kiçe û kure beyek şad debin.

Bizûtnewey mirovdostan piştîwaniyan le hengawî dadga kird. Gutyan eme pêşkare bo sedan kêşey lem babete ke çawarwanî çare ser kirdinin.

Eme hengawêkî bextewer bû bo take afretêk, belam bazêkî mêjûyî bû bo afretanî Pakistan. Lemew la ewanîş mafî helbijardinî hawbeşî jiyaniyan heye.

# Kevintirîn gundê cîhanê li Başûrê Kurdistan

Jînî Niwê - Lenden

Arkologên Iraqê gundek, bi kevniya 11000 salan di nizîk bajarê Mûsila, Kurdistana başûr peyda kirine. Bi gotina "Moayid" serekê dezgeha arkolojiya Iraqê malên wê gundî bi xiştên kur' hatin awedan kirin. Musil navê wê Nêynewa, ser bajarê dewleta Mêd bû, ko bingehekî mezine bazirganî dihat hesab kirin. Berî wê peyda kirinê kevintirîn baxçeyek ko hatibû peyda kirin ya 7000 sala berê bû ko ev jî her di Başûrê Kurdistan hatibû peyda kirin. Bi wî awayî ew gunde carê kevintirîn gundî cîhanê ye û Kurdistan êk ji kevintirîn bingehên şaristaniyê di ser erdê ye.

# Serkewtinî Sosyalîstekan le Feranse

## Lionel Jospin bû serokwezîran

Rojî yekşemmo 1,6,97 le dewrî dûhemî helbijardinî Franseda yekyetî çepekanî Feranse be bedest hênanî zorayetî reha (mutleq) bo perlpman, hikûmetî yekyetî rastekan tûşî şikêstêkî zor qursî kird.

Soscialîstekan be bedest hênanî 289 kursî le 577 kursî bûne zorayetî le perlemanî Feranxeda.

Jak Şîrak le mangî Aprîlî emsal perlemanî helweşand û helbijardinî niwê kira ke be şikêstî partekey rastî xoy tewaw bû.

# Mafê Mirov li Tirkiyê

Dersîm û her wisa yasaya hikûmete eskeriye başûra Tirkiyê ev xalên giring bûn ko rêya Tirkiyê bo pelixandina mafê mirov xweş dikin.

Di midehê 6 mehên derbaz bûy da û piştştî hatina Tirkiyê bo nav gumruka serbeste Auropa rewşa mafê mirov li Tirkiyê ber bi xiraptir bûnê çoye. Tirkiye divê PKK hegera destpêkiya pêşêl kirina mafê mirove. Yasayên Tirkiyê di sala 1923 yan hatin pesend kirin. PKK di sala 1978 hat damezrandin.

Di Aurûpa û Yasayên nawnetewî midehê girtina bê pirs 4 roje. Li Tirkiyê li mezoptamiya midehê girtina bê pirs 15 roje û li Kurdistanê 30 roj. Di vê midehî de gelek ji girtiyan tên eşkence dan û kuştin.

"Rûniştivanên Tirkiyê her di destpêkê de bi hizra Kemalîsm tên perwerde kirn bi teherek ko tenanet sazûmanên çepe Tirkî weke DÎSK û ên din jî dema navê kêşeya kurd tê kirin hizra kemalism rêya wan nade ko rastiyan bibînin" Eren Keskîn got.

Eren Keskîn parêzere tirke, ko di Novembera 1995an de bi tawana alî girî di PKK hati bû girtin, niho berpirsyarê Rêkxistina Mafê Mirov li Istanbolê ye û di cîhanê de weke çalakeke mafê mirov hatiye nas kirin.

Kurttirîn mewday navbera du xalan RAGEHANDINE

Heger te divê berhemên te bê frotin.

Heger tu dîv mişteriyên teze digerêy

Heger dîv heval û nasan digerêy

Jînî Niwê Peyamate vê bigehîne zêdeyî 25 welatan!

- Bo belavkirina ragehandin (Reklam)ên xwe pêwendiyê bi:

Pîroz be
400 saliya
Şerefxanî

# JÎNÎ NIWÊ

Issue 15 June1997 | WEŞANA MEDYAY CIHANIYE KURD | Hejmar 15 Cozerdan 1997 Buha £1

## PDK:
## Dilê me ji bo indamên PKK naşewite ger bi destê her kesî bên kuştin

**Jini niwê - Lenden**

*** PKK: Em vê toley wan êrişane bikin-ve.**
*** Turkiye: Eva hêrişa dûmahî anîna PKK ye.**
**PDK: Dilê me ji bo PKK naşewite.**



*Peşmergeyşn PDK tevî leşkerê Tirkiye di şerê PKK*

Artêşa Tirkiyê di roja 15ê Mey derbaz bûy gewretirîn hêrişa xwe di dema komara tirkî hatiye damezrandin bi 100 hezar serbaz kire ser serhildayên kurd e indamên PKK. Bi gotina Tirkiyê PKK ji Başûra Kurdisnê êriş dike ser bingehên serbaziye Tirkiyê.

Di midehê çend hefteyande toraniyan bingehên PKK di başûr xapûr kirine û zêdey 200 km çone nav xaka başûr ko bin deselata PDK ye. PDK di van şeranada hevalbendiya Tirkan dike û tevî tirkan şerê PKK dike.

Bajarên Zaxo, Hewlêr û gelek bajarên dine Başûr bindestê serbazên tirkane. Hewlêr sala par di meha gelawêjê carekêjî di aliyê serbazên Iraqî, bi dawiya PDK, hatibû dagîr kirin.

Ser gotina tirkan di vê êrişê de ko bi piştgiriya helîkopter û "F-16"-an hatiye kirin zêdey 1400 li şerkarên PKK hatin kuştin. Dewleta tirk divêko hetanî PKK bi tewawî ji nav nebe li Başûr dernakeve.

PKK divê ko tenê 30 gerîllayên van hatin kuştin lê hejmarek zor li jin û zarokên başûr û kampa Artûşê hatin qetlandin. Gelak ji gundên Başûr hatin xapûr kirin û xelkê wê aware bûye. Ser gotna ragehandinên PKK hejmarek nediyar ji serbaz û caşên Tirkiyê hatin qetlandin û zêdey 100 pêşmergeyên PDK di şer bo Tirkan hatin kuştin.

YNK hetanî niho di henber wê êrişê, ko bixweşî serbazên Iranî di gelawêja 96 an anî bû Başûr, bêdeng bûye. Tenê di gazinde li Tirkankiriye ko êriş neke ser deverên bin deselate YNK.

PDK ko pêşberiya şer dike di ragehandina mekteba siyasiye xwede da xuya kirin ko: "Ger indamên PKK di her derê bi dest herkesê bên kuştin dilê me jivana naşewite, ewana nexweşî ji bo Kurdistan û deverê saz kirine"

Welatên Rojawa û Rêkxistina Neteweyên Yekgirtî (UN) di dij kiryareka ne ciddî de xwazyarê derkeftina hêzên Tirkiyê ji "bakûra Iraqê" bûn.

Abdullah Öcelan serekê PKK swînd xwariye ko toleya wan hêrişane li tirkan veke bi êrişên xwe gorîkirin bo ser bingehên serbazî û abûriye Tirkan.

## Hilbijartinî serekkomarî le Iran şikestêk mezin bû bo deselatdaranî ayînî

**Kurmanc Hakki - Lenden**

Beşdarî bêwêney milyonha Iranî le helbijadinî serkokkomarî Îslamî bû be hoy ser sûrmanî hemû layek. Mihemmed Xatemî ke pênc sal lemew ber le wezaretî "Ferheng û Irşadî Îslamî" be hoy tundrewekanî dînî kişabûwe be bedest hênanî 70 % dengekan be ser Natiqî Nûrî, ke serokî Meclîsî Îslamî û palêwrawî Ayatullah Xameneyî rêberî komarî Islamî bû serkewt. Natiqî Nûrî tenya tiwanî 25 % dengekan wedest bênê.

Lewetî komarî Îslamî hatûte serkar le mawey 18 salî rabirdû da bo yekem car xelkê Iran betaybetî lawan û jinan le helbijardinda wa beşdariyan kirduwe. Hemû bew birwaye bûn ke Xatemî lewaneye 2 yan 3% ziyatir le dengekan wedest bênê û komarî îslamî detwanê be deskarî le akamî dengekan palêwrawî dilxwzî xoy Natiqi Nûri helbijêrê. Belam ciyawazî hejmarî dengekan ewende zor bû ke Komarî Îslamî be carêk hepesa. Le 33 milyon dengderan 88 % yan amadey dengdan bûn. Em rêjeye le mêjûy Iran bêwêneye.

Xatemî be danî diruşmî be riwalet lîberal û sozî beşdarî jinan le çalakiyekanî siyasi wilat be ser rikeberî xoy ke layengirî bê emla û ewlay "wilayetî feqîhe" serkewt.

Ziyatir le 300 kes le kesayetiyekanî siyasî û ayinî Iran xoyan palêwra bû bo helbijartinî serek komarî Iran, ke 9 kesiyan yan jin bûn. Belam lelayen "Şûray Nîgehban"ewe tenya palêwrawî 4 kes pesend kira.

Be pêy distûrî bingehî Komarî Islamî, serek komar debê "piyawêkî mezhebî, siyasî û şîie bê ke bawerî be wilayetî feqih hebê". Bew pêye ziyatir le nîwey xelkî Iran ke kemayeiye mezhebiyekan û ayîniyekan û jinan degrêtewe natwanin bibine palêwrawî serokkomarî.

Bê guman helbijardinî Xatemî leber ewey nebuwe ke xelkî Iran nawbirawiyan nasîwe, boçî ke Xatemî le mawey 5 salî rabirdûda le naw

Bo RP 2

JÎNÎ NIWÊ

- Eger tu xema kalayên xwe diwoy
- Eger tu mişteriyên nû dixazî
- Jînî Niwê Dengê te wê bigehîne zêdeyî 25 welatan

Jînî Niwê
REKLAMAN
WERDIGIRE

Tel: 0410 456020
Fax: 0171 7237374

## Mafê mirov li Tirkiyê

**Jînî Niwê - Lenden**

"Di 24ê meha sêptembirê, ez tev hevalek xwe li bajar de hatim girtin. Polîsan em bi erebê birin derewey bajar. Em dabezandin û piştê çend teqeyek hewayî kirin. Gotin me terorîst kuştin. Vêca em rût kirin û destdirêjî kirin. Piştî em birin zîndana Gebze nizîk Ankara, şikenca elektrîkî hatim kirin. Ez berê hatibûme emel kirin. Dema şikencê polîsan tecawiz bi min kirin. Vêca ji piştre dar li min dikutan. Ev car ez bi zor rûniştandim ser dar. Dîsan ez bi elektrîk dan şikence dan .....". Eva gotinên muwekkîlê Eren Keskîn, çalakê binav û denge mafê mirove Tirkiyêye ko di civîna "Mafê mirov li Tirkiyê" anî ser ziman.



EREN KESKIM, XEBATKARE MAFÊ MIROV LI TIRKIYE

Roja 17. Adarê civînek bi pardariya Kemal Yildiz, serekê Pirojeye Mafê Mirov bo Kurdistan, Eren Keskîn indamê rêkxistina mafê mirov li Tirkiyê (IHD), Brian Phillips niwênerê Rêkxistina Lêxosşbûna Nawnetewî (Amnesty International), Jermy Corbyn indamê Parlemana Birîtanya pêk hat. Di civînê basa dûmayîn bûyerên nav xweye Tirkiye û kêşey mafê mirov li tirkiyê anî ser ziman.

Pareke giring di civînê bo bas di ser ysayên Tirkiyê ko konvansiyona Gênêva û hemî peymanên mafê mirovin, ko Tirkiyê navandiye hatibû terxan krin. Yasaya bingehiye Tirkiye madey 8, ko dij terorîsmê hatiye danin, yasayên gişkiye §165, 159, 132, yasaya

Bo RP 2

Divê Hejmarêde

Mîn metirsî katî aştî

400 saliya Şerefxanî

Afretêkî Pakistan be dilî xoy şûy kird RP15

Kontirîn gundî cîhan le KURDISTAN RP 15